**Mukaddime, 2023, 14(1), s. 73-88.**
**DOI: 10.19059/mukaddime.1182700**

# Romaneka Dîrokî Ya Dîroknasekî: Zeynel Bega Îhsan Colemêrgî

**İlyas SUVAĞCİ**[1]

## Bir Tarihçinin Tarihi Bir Romanı: Îhsan Colemêrgî'nin Zeynel Beg Adlı Romanı


### Öz

Tarih ve roman toplumların ve bireylerin hayatlarını ele alan iki önemli unsurdur. Tarihçi bilgi ve belgelere dayanarak yaşanmış olayları aktarırken romancı ise gizli ayrıntıları ve hayatları yorumlar. Bizler de bu çalışmamızda bir roman yazılırken tarihten nasıl faydalanılabileceğini Îhsan Colemêrgî'nin Zeynel Beg adlı romanı üzerinden inceledik. Eser Kürt edebiyatında, roman türünde Hakkari tarihini anlatan ilk örneklerdendir. Bu nedenle eserin incelenmesi önem arz etmektedir. Zeynel Beg adlı romanı ele alan bu çalışmada; olay, kişi, yer ve zaman ögelerini nasıl kurgulandığı, tercih edilen anlatıcı türünün romanın kurgusunu nasıl etkilediği, eserin diğer tarihi romanlarla ne tür benzerlikler taşıdığı, incelenmiştir. Çalışmada nitel araştırma yöntemi olan içerik analizine başvurulmuştur. Hakkari tarihi üzerine araştırmaları olan Îhsan Colemêrgî'nin tarihçi yönü söz konusu romanında da görülür. Olaylar bir romancıdan ziyade bir tarihçinin bakış açısıyla anlatılmıştır. Bundan hareketele yazarın, bir roman yazmak için tarihten faydalanırken eserde kendisini anakronizm örneklerinden de kurtaramamıştır.


**Anahtar Kelimeler:** Tarihi roman, Kürt romanı, Zeynel Beg, Hakkari tarihi, Îhsan Colemêrgî.


### Kurte

Dîrok û roman du hêmanên sereke ne ku behsa jîyana civak û ferdan dikin. Çawa ku dîroknas xwe dispêre belgenameyan û bûyerên berê radigihîne romannivîs jî kitekit û jîyanên ku di dîrokê da nepenî mane şîrove dike. Em di vê xebata xwe da li ser romana Îhsan Colemêrgî ya bi navê Zeynel Beg bisekinîn gelo di vê romanê da nivîskarî çawa ji dîrokê sûd wergirtîye. Wekî cureyeka romanê ev berhem di edebîyata Kurdî da yek ji nimûneyên ewil yên ku li ser dîroka Hekaryan e. Lewma lêkolîna me ji ber vê sedemê girîng e. Di vê xebatê da me ev pirs bersivandin; gelo hêmanên romanê yên binyadgerî yên wek zîncîreya rûdanê , karakter , zeman û mekanî çawa


1 Dr. Öğr. Üyesi, Hakkari Üniversitesi, Rektörlük, Türk Dili Bölümü, ilyascembeli@gmail.com, ORCID: 0000-0001-6409-1229.

**Makale Gönderilme Tarihi: 30.09.2022, Kabul Tarihi: 31.01.2023**

hatine honandin, cureyê vegêr bandoreka çawa li ser romanê kirîye, wekhevîyên vê berhemê ligel romanên dî yên dîrokî çi ne? Me rêbaza nirxandina naverokê ya çawahînîyê bi kar anî. Me dît ku di navbera nivîskarî û berhema wî da têkilîyeka girîng heye. Bûyerên ku di romanê da tên vegotin ji riwangeha romannivîsekî zêdetir dişibe ya dîroknasekî. Lewma mirov dikare bibêje ku di berhemê da mînakên anakronîzmê jî tên dîtin. Lewma nivîskarî ji bo nivîsandina dîrokê roman wek amûrekê bi kar anîye.
**Peyvên Sereke:** Romana dîrokî, romana Kurdî, Zeynel Beg, dîroka Hekaryan, Îhsan Colemêrgî.

## A Historical Novel by a Historian: Îhsan Colemêrgî's Zeynel Beg

### Abstract

History and novel are two important elements that deal with the lives of societies and individuals. While the historian conveys the events that took place based on information and documents, the novelist interprets the hidden details and lives in history. In this study, we analyzed how to use history while writing a novel through Zeynel Beg's novel by Ihsan Colemêrgî. It is one of the first examples in Kurdish literature that mentions about the history of Hakkari in a novel genre. Therefore, it is important to study this work. In this study, which analyzes the novel named Zeynel Beg; how events, person, place and time are fictionalized, how the type of preferred narrator affects the fiction of the novel, and what similarities the work has with other historical novels are examined. In our study, we applied to content analysis, which is a qualitative research method. Îhsan Colemêrgî's historian identity, who has researches on the history of Hakkari, is also seen in his novel. The events are narrated from the perspective of a historian rather than a novelist. Based on this, the author could not save himself from the examples of anachronism while making use of history to write a novel.
**Keywords:** Historical novel, Kurdish novel, Zeynel Beg, Hakkari history, Îhsan Colemêrgî.

### Extended Abstract

Events in history affect societies or individuals. This situation also has reflections on literature or art. If we focus on the field of literature, for example, novelists often reflect historical events that they have seen and experienced in their own lives. From this point of view, it can be said that there is an important relationship between history and literature. By looking at the author's novel, it can be understood how the events in the period when the work was written affected the novelist. For this reason, literary works can also be used in history learning. Among other modern literary genres, especially the novel has the privilege of various and rich narrative possibilities and the privilege of narrating the events as if they were experienced again through fiction. Novels describing a historical

event are evaluated in the category of historical novels. In this type of novel, the novelist does not rewrite history. He interprets the events that are hidden or not understood in history according to the peculiar rules of the literary world. For this reason, historical novels should not be seen as a definitive and historical document. In historical novels, the plot is fictionalized on history. A historical event, person or persons are mentioned. The persons in these novels may be a real person from history, or they may be an imaginary person. Historical novels can be popular, biographical, modernist, or postmodernist. In Kurdish literature, there has not been much study on historical novels written in Kurmanji dialect. We aimed to contribute to this small number of studies in the field with this review of Îhsan Colemêrgî's novel named Zeynel Beg. Another purpose of our review is to determine the parallels between the historiography and novelism of the novelist. We explained the purpose of Îhsan Colemêrgî in writing a historical novel, how far he achieved this goal, and how his historian side affected his novel writing. Although the novel is about the life of Zeynel Beg, who ruled Hakkari in the 16th century, it actually presents an overview of Hakkari history in this century. He also talks about the struggles of the Kurds with each other, with the Ottoman and Safavid States in this period. In order to establish a national consciousness, writers need complete and good models and characters in historical novels. In the novel we have examined, it is seen that the author idealizes the characters in order to show their good sides. When talking about an event that happened in history, references to the author's own time are seen rather than the conditions of the time when the event took place. For this reason, examples of anchronism are also seen. Each of the novel characters interprets events like a historian while describing an ordinary or major event. It is told that people of different faiths and races such as Kurds, Assyrians, Jews and Armenians live side by side in peace in the same geography. Therefore, it is seen that this is actually a reflection of the multiculturalism of modern times. All these show that the characters of the novel are fictionalized differently from the typical, ordinary people of their era as in reality. Although the author sometimes tried to benefit from folklore elements such as proverbs, idioms, folk beliefs and children's games to get rid of this, it can be said that this is not enough. The author prevented the characters from speaking with their own voices, describing the events as they saw them, and did not attempt to show how their psychology was. As a result of all these, it shows that although the author's aim is to write a historical novel, he considers ideological concerns rather than aesthetic concerns, and therefore he cannot get away from historiography.

**Destpêk**

Bûyerên di dîrokê da diqewimin bandorê li ser jîyana takekesî û civakî dikin. Wek endamekî civakê nivîskar yan jî romannûs jî gelek caran di berhemên xwe da cih dide bûyerên ku ew jîyaye. Wate, her çawa jî be ew nikare xwe ji bin bandora wan xelas bike. Lewma mijar çi be û çiqas jî takekesî be ew dê kêm yan jî zêde di berhema xwe da hêmanên civaka ku jê derketîye binimîne. Bi vê yekê em xwe digihînin têkilîya di navbera dîrok û edebîyatê. Herçend ku du qadên cuda jî bin di gelek xalan da edebîyat û dîrok digihin hev. Lewra ji bo nirxandina berhemeka edebî divê pêşîyê em li dîroka nivîsandina wê binêrin ka gelo şert û mercên dema ev berhem hatîye nivîsandin çawa bûye, vê yekê bandoreka çawa li ser hiştîye. Her wiha gelek caran berhemên edebî ji bo hînbûna dîrokê wek amûrên girîng tên dîtin. Ev jî nîşan dide ku di navbera dîrok û edebîyatê da danustandineka xurt heye.

Ji ber pirdengî û kompleksbûna wê di nav cureyên edebî da roman xwedîyê cihekî girîng e, her wiha ew di danûstandina dîrok û edebîyatê da yek ji mînak û amûrên sereke ye. Lewma roman li gor cureyên dî yên edebîyata modern, "ji ber kêrhatîbûna vegotinên cuda, cîhanên mimkûn yên cuda û ji bo civakî û gelejimarîyê" (Altuğ, 2017:157) lêhatî ye. Romanên ku bingeha wê li ser bûyereka dîrokî ava bûne wek "Romanên Dîrokî" tên binavkirin. Ev cure roman, ji dubare nivîsandina dîrokê zêdetir alîyên dîrokê yên ku bi rêbazên zanista dîrokî nehatine zelalkirin û nepenî şîrove dike. Li gor rêbazên edebîyatê wê ji nû ve dihone. Lewma ew ne dîrok e, bi tenê sûdwergirtina ji dîrokê ye. Bûyersazîya wê li ser dîrokê ava dibe û behsa mijar û kesayetîyên dîrokî dike. Lehengên romana dîrokî yan kesayetîyên rasteqîn yên dîrokî yan jî kesên xeyalî ne. Lewma romannûs ne mecbûr e ku romana xwe teqez li ser jîyana kesên rasteqîn binivîse. Di demê da çend guherîn di romana dîrokî da çêbûne. Ew di nav xwe da ji van binbeşan pêk tê (Yalçın-Çelik, 2005:76):



1) Romanên dîrokî yên rasteqînî û kronolojîk: Romanên dîrokî yên populer, Romanên dîrokî yên bîyografîk û bîranînî

2) Romanên dîrokî yên modernîst

3) Romanên dîrokî yên postmodern

Di sedsala 19an da em mînakên ewil yên romanên dîrokî dibînin. Gyorgy Lukacs dibêje her çend bê gotin di sedsalên 17an û 18an da jî romanên dîrokî hatine nivîsandin ev dê nerast be. Ji ber ku di van berheman da derûnîya lehengan û nirxên exlaqî bi yekcar yên dema romannûsan bixwe ne; lewma bi tenê mijar û clûbergên van romanan dîrokî ye. Mînaka ewil ya romana dîrokî berhema bi navê *Waverley* (1814) ya romannûsê Îngilîz Sir Walter Scott e (1771-1832). W. Scott ligel çîrokên gelêrî û efsaneyên gelê Îskoçî behsa "Serhildana Jacobite" (1745) û şerên Îngilîzan yên mîrnişînîyê dike. Bi bawerîya G. Lukacs di mînakên berîya *Waverley*ê da hêmana dîrokê bixwe tune ye û taybetmendîyên lehengan ne têkildarî dema xwe ne. Gelo çima romana dîrokî bi taybet di

destpêka sedsala 19an da derket holê? Gyorgy Lukacs vê pirsê bi şoreşa Fransayê, têkçûna Napolyon, belavbûna kapîtalîzmê û fikra netewetîyê rave dike. Piştî van bûyeran dîrok êdî dibe "serpêhatîyeka girseyî" lewma jîyana takekesan rasturast di bin bandora dîrokê da maye. Ew kes têdigihin ku hebûna wan girêdayî bûyerên dîrokî ne (Lukacs, 2008:21-25). Bêguman ji ber fikra netewebûnê, ku bi romantîzmê belav bûye, romana dîrokî xwe digihîne gelek xwîneran û bandorê li ser wan dike (Argunşah, 2010:454). Ji ber ku di van berheman da gel, pêrgî dîroka xwe ya mezin dihat, ji vê cure romanê gelek hat hezkirin. Nivîsandina romanên dîrokî piştî Îngîlîstanê pêşîyê li Fransa, Elmanya, Rusya û Îtalyayê û piştre li gelek welatên dî belav bûye. Heta îro jî ji vê cureyê gelek tê hezkirin.

Di roja me da jî her cure romanên dîrokî tên nivîsandin. Di edebîyata Kurdî da em zêdetir pêrgî romanên dîrokî yên rasteqînî û kronolojîk tên. Ev yek girêdayî pêvajoya netewebûna Kurdan e. Ne bi tenê romanên Kurdî yên dîrokî mirov bibêje bi giştî edebîyata Kurdî ya modern di bin bandora vê yekê da maye ev wê nebe mubalexe. Wate, mînakên ji nû ve nivîsandina dîroka Kurdan û avakirina hişmendîya neteweyî di berhemên edebîyata Kurdî ya modern da pir in. Yek ji nimûneyên vê yekê romana Îhsan Colemêrgî ya bi navê *Zeynel Beg* e. Herçend ku li ser romanên Kurdî yên dîrokî yan jî têkilîya roman û dîrokê di kovar û pirtûkan da çend xebat[2] hebin jî li ser romana navborî tu lêkolîn nehatine kirin. Lewma ev xebata me girîng e. Me ev lêkolîn li gorî rêbazên vegêrannasîyê û nirxandina naverokê ya çawahînîyê kir. Bi vê rêbazê wateyên berhemê yên nepenî mirov dikare derxîne holê. Ev rêbaz dê ji bo têgihiştina têkilîya jînenîgarîya nivîskarî û romana wî kêrhatî be. Ji ber ku yek ji armanca sereke ya vê xebatê ew e ku têkilîya dîroknasîya Î. Colemêrgî û romannûsîya wî derxîne holê. Gelo Colemêrgî wek dîroknasekî xwestîye bi nivîsandina romaneka dîrokî çi bike, çiqas gihiştîye armanca xwe, dîroknasîya wî bandoreka çawa li ser romannûsîya wî kiriye, di romanê da kîjan mijar derdikevin li pêş. Piranîya romannûsên Kurd yên romanên dîrokî nivîsandine wek Î. Colemêrgî dîroknas nîn in, yan jî berhemên wan yên li ser dîrokê tune ne. Lewra ji ber balkişandina têkilîya di navbera kurtejîyana nivîskarî û romana wî da ev xebata me ji yên berîya xwe cudatir e. Armanca me bi vê xebatê ew e ku ew piştgirîya lêkolînên li ser romanên Kurdî yên dîrokî bike.



### 1. Bîyografîya Îhsan Colemêrgî

Îhsan Colemêrgî di sala 1944an da li Colemêrgê ji dayîk bûye. Wî dibistana seretayî û ya navîn li Colemêrgê xwendîye, di sala 1965an da li Diyarbekirê dibistana mamostetîyê xelas kirîye. Piştî 8 salên mamostetîyê ji ber fikrên wî yên sîyasî wî sirgûn dikin Uşakê. Lewma ew karê mamostetîyê berdide. Piştî derbeya

2 Hinek ji van xebatên ku rasterast li ser romanên Kurdî yên dîrokî yan jî li ser têkilîya roman û dîrokê disekinin ev in: (Adsay, 2013, Adsay:2014), (Sahand, 2016), (Ölmez, 2018), (Hesen, 2019), (Zirarî, 2017), (Turan, 2020).

leşkerî ya 1980ê demekê tê girtin. Li ser edebîyat, dîrok û mîtolojîya Kurdan di gelek kovar, rojname û malperên Kurdî da nivîsên Colemêrgî hatine weşandin.

Berhemên wî:

Roman: 1. Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan, (Çapa Yekem, Apec, 1995; Çapa Duyem, Avesta 2001) 2. Zeynel Beg (Lîs, 2018), Ezemşêr (Lîs, 2020), Momê (Lîs, 2020).

Dîrok û Lêkolîn: 1. Hakkari Suretleri (Sümbül Dağı'nda Ayın Doğuşunu İzlerken), (Lîs, 2006) 2. Mezopotamya Uygarlığında Hakkari (Lîs, 2006) 3. Dîrok û Şaristanîya Ûrartûyîyan (Lîs, 2019), Siltanê Kurd Selahadîn Eyûbî Şêwirmend û Fermandarên Wî Ên Hekarîyanî (Lîs, 2021), Şîna Şengalê (Lîs, 2020), (Bernamegeh, 2020).

## 2. Wek Romaneka Dîrokî *Zeynel Beg*

### 2.1. Bûyersazî

Di romana Îhsan Colemêrgî ya bi navê *Zeynel Beg* da ji dayîkbûnê heta mirina wî behsa jîyana mîrê Hekaryan Zeynel Beg (?-1585), şerê navxweyî li ser mîrektîyê, şerê di navbera dewletên Osmanî û Safewîyan da tê kirin. Roman ji 16 epîzotan pêk tê û ew wek rêzebûyer girêdayî hev in. Wate, bi awayekî kronolojîk em li alîyekî jîyana takekesî ya Zeynel Beg li alîyekî din jî rûdanên di mîrektîya Hekaryan diqewimin hîn dibin. Pê ra di her epîzotekê da li ser dîroka mîrektîyê agahî tên dayîn lewma di ragihandina serborî û jîyana karakteran da ji çîrokên di nav çîrokan zêdetir em bi taybet bûyerekî sereke dibînin. Lê ji ber ku di her epîzotekê da pir agahîyên dîrokî tên ragihandin em carinan ji vê bûyerê dûr dibin, dikevin nav rûpelên dîrokê.



Mîr Melekê babê Zeynel Beg pevçûna di navbera herdu dewletan da li pişt Safewîyan digire lê Begzade Zeynel alîgirê Osmanîyan e. Lewma ew ji bo serhildaneka li hember babê xwe ligel Osmanîyan dikeve têkilîyê. Li rexê dî ji bo bidestxistina mîrektîyê Safewî jî piştgirîya mamê Zeynel Beg Seyîd Mihemed û kurê wî Yaqûb Begê dikin. Ji bo ku Mîr Melek bikin şirîkê xwe Safewî êrîş dikin li ser Geverê. Hêzên mîrektîya Hekaryan bi alîkarîya siwarên Zeynel Beg vê êrîşê dişikênin. Lehengîya Zeynel di vî şerî da hêza wî ya di mîrektîyê da mezin dike. Wexta Mîr Melek ji bo vê serkeftinê pîrozbahîyê diket Zeynel bi 2500 çekdaran êrîşê dibe li ser zoma babê xwe û wî dîl digire. Piştî ku Zeynel Beg tê ser textê mîrektîyê mamên wî Seyîd Mihemed û Yaqûb Begê[3] serî radikin. Ew bi alîkarîya Safewîyan û eşîra Pinyanişîyan bi ser dikevin. Zeynel Beg bi kotekî xwe xelas dike û xwe dispêre mîrektîya Amêdîyê. Zeynel Beg li wir bi alîkarîya Mîr Husên ji bo ku

3 Pêşîyê Yaqûb Begê û Seyîd Mihemed weku mamên Zeynel Beg tên danasîn (r.67). Lê piştî ku Zeynel Beg ligel Osmanîyan hêzên mamên xwe têk dibe wê demê tê gotin ku Seyîd Mihemed û kurê wî Yaqûb tên bidarvekirin. (r.113) Lewma mirov nizane ka çawa kesê ligel Seyîd Mihemed serî radike birayê wî be û wexta serhildan dişikê yê ku tê bidarvekirin dibe kurê Seyîd Mihemed.

dîsa bê ser text diçe Stenbola paytexta Osmanîyan. Pereyên ku ji Mîr Husên qer kirine dide serokwezîrê Osmanîyan Rustem Paşa. Osmanî jî ji ber berjewendîyên xwe dixwazin fermana mîrektîyê bidin Zeynel Beg. Wexta Zeynel Beg vedigere, Osmanî ji bo vê yekê êrişê dibin li ser Hekaryan. Ew, Seyîd Mihemed û kurê wî Yaqûb bi darve dikin. Zeynel Beg ji bo ku qayîmkirina mîrektîya xwe dîsa diçe Stenbolê. Li wir ji keçikeka Bosnayî ya bi navê Atîye hez dike û ew biryara zewacê digirin. Dema Zeynel Beg li Stenbolê di rêveberîya da valahîyek çêdibe, Begzade Yaqûb û birayê Zeynel Beg Bidax ji vê rewşê îstîfade dikin. Lewma dema Zeynel Beg vedigere Hekarîyê ligel Osmanîyan, Begzade Yaqûb û birayê xwe Bidax digire û wan bi darvedike. Piştre dîsa tê ser text, ligel Atîyeyê dizewice. Heta 70 salîya xwe mîrektîya Hekaryan dike, piştre cihê xwe ji kurê xwe Seyîdxan Begê ra dihêle. Dema Osmanî dixwazin ji Safewîyan bajarê Tebrîzê bistînin ew bi alîkarîya hêzên mîrektîya Hekaryan êrîş dikin. Di vî şerî da Zeynel Beg tê kuştin.

### 2.2. Îdealîzasyon

Di edebîyatê da nivîskar carinan; kes, rewş û kirinên ku di jîyana rasteqîn da nînin bi rêya tîp yan jî modelan heçku ew hene wan ava dike. Ji alîyê nivîskarên ku li pey parastina dozekê ne ev tîp yan jî model tên afirandin. Ev kesên îdealîzekirî ji taybetîyên kesane zêdetir xwedîyê nirxên hêja yên civakî û neteweyî ne. Ew di jîyana rojane da tune ne, ji alîyê nivîskarî ve tên “keşifkirin”. Nivîskar wan wek mînakên herî baş û îdeal pêşkêş dike, lewma ew bîr û bawerîyên nivîskarî dinimînin. Ev kes ji bo bidestxistina nirxên neteweyî, dînî, felsefî hwd. têdikoşin û fedakarîyê dikin (Çetin, 2008: 151-152). Di romanên dîrokî da jî ji bo avakirina hişmendîyekî neteweyî pêdivîya nivîskaran bi karakter û modelên baş û bêkêmasî heye. Di romana *Zeynel Beg da* jî nivîskar ji bo ku alîyên baş yên karakteran nîşan bide wan îdealîze dike. Gelo nivîskar vê yekê çawa dike? Ji bo vê yekê em ji romanê çend mînakan bidin.

Nivîskar bi rengdêrên baş, taybetmendîyên van kesan dişibîne kesayetîyên dîrokî. Ev kes ji malbateka esil tên, çu kêmasîyên wan nînin. Wek mînak wexta Begzade Zeynel ji dayîk dibe ew wek yekî “pir jîr, bizav û lawîn” xuya dike, “zendên wî mîna hevristên dol Çîyayê Mere badayî”, “rûyê wî wek şemala ronahîyê” ye. Ew rengê Rustemê Zal dide û xuya ye ku dê weku wî bibe “mêrxas”. (r.9) Ev taybetîyên Zeynelî ji alîyê nivîskarî ve wek nîşanên geşkirina qesra mîrektîya Hekaryan tê şîrovekirin. Dayîka Zeynel Beg, Mîran Xan jî –ku ew jî keça Mîrê Somayê ye- “bi bedewîya xwe rengê Zîna xwîşka Mîrê Botanê ya destgirtîya Memo” dide (r.10)

Wexta nivîskar behsa endamên civîna dîwanê ya Mîr Melek dike vê îdealîzekirinê digihîne asta herî bilind. Her endamekî dîwanê di karê xwe da şareza ye. Ew wexta mafê axaftinê digirin di çarçoveya pisporîya xwe da ji bûyerên dîrokî mînakan didin. Bi vê yekê dixwazin bala Mîr Melek bikêşin ku ew jî wek rêveberên berî xwe heman xeletîyan dubare neke. Bi taybet endamên civîna berteng “xwendevan, zana, têgihiştî û pispor” in, haya wan “ji bûyerên sedsala paşê” heye. (r.25) Yek ji endamên dîwanê, şêwirmendê sîyaseta ligel Osmanîyan

Şêrko ye. Ew, Erebî û Osmanî baş dizane. (r.26) Şêwirmendê têkiliyên Îranê Mele Hişyar, alimekî navdar û xwedan ilmekî kûr e. Wî pirtûkên derbarê "dîrok, zagon, civaknasî û derûnîyê" xwendine, her wiha ew dersê dide feqeyên mizgeftê. (r.28) Şêwirmendê danûstandinên Mîrê Botan û Bahdînanê Şahbazê Lêwînî, "rêz û rista eşîrtîyê, begîtî, axatîyê" (r.30) baş dizane. Dizdarê Kelata Colemêrgê Mêrxasê Sergivandeyî wek "şêrê çîyayan, pilingê zozanan, melkemotê nav çavên dijmina" tê nasîn. "Rêveberî, pêşengîya silh û selahetê" ew çareser dike. Hemû xwecihên kelehê û rêveberîya mîrektîyê ji helwestên wî yên derbarê aştîyê da dilşad in. (r.32) Fermandarê leşkerî Keleşê Çîyareşî, yekî wisa ye ku "tirsê nizane", ew "siwarekî baş e, di şerê şûr û mertalan de navdar e", haya wî "ji çêkirina artêşa Osmanî û Safewîyan" heye. Her wiha "der barê şerê Çardêranê de jî lêkolînên wî hene" (r.46). Yek ji mirovê "herî zana û aqilmend" şêwirmendê Mîr Melek yê sereke Egîdê Koxî ye. Ew di perwerdeya xwe da li bajarên wek Şam, Bexda, Stenbol û Îsfehanê maye. Di ilmê sîyaset, dîrok û qanûnê da pispor e. Ew hostayê zimanê Farisî ye, alîyê wî yê helbestvanî û helbestxwendinê jî heye. Ew kesên wek; Baba Tahirê Hemedanî, Elîyê Herîrî, Şêx Hesenê Êzidî, Umer Xeyam, Ebdulsemed Begê Hekarî baş nas dike. Ew li herema Hekaryan "rola şêwirmendê Selahedînê Eyûbî Îsa El Hekkarî dileyîze" (r.50).

Nivîskar wexta li ser erdnîgarî, eşîr û niştecihên mîrektîya Hekaryan agahîyan dide dîsa berê xwe dide îdealîzekirinê. Li ser "mêranî û mêrxasîya" eşîrên herêma Hekaryan tê gotin ku ji serdemên peşîn û heta wê demê "hîlebazî, durûtî û fêlbazîyê hêj di nav eşîrên herêmê de bingeha xwe çênekiriye" (r.23). Hekaryan wek "şûnwareke şervanên bi nav û deng" tê zanîn. Di dewleta Eyûbîyên Misirê da gelek leşker û rêveberên eslê xwe ji Hekaryan in cih girtine (r.46). Fermandarê Mîr Melek Keleş jî "kevneşopîya wan mêrxasan" berdewam dike (r.47). Di cengan da "heta çeloyekî Colemêrgî deh kesan nekuje paş de venagere baregaha xwe", "tirsa mêrxasî û şervanîya mirovên Hekaryan ketiye dilê hemû dost û neyaran" (r.47) Leşkerên wan "wekî leşkerê Ereban, Farisan û Osmanîyan li komkirina xenîmetê nagerin" (r.48)

**2.3. Anakronîzm**

Di edebîyatê, sînemayê û beşên dî yên hunerê da bûyer carinan ne li gor dema ku ew rûdane tên nîşandan. Ev têgihiştina kesekî, bûyerekî û alavekê ji derî-zemanî weku anakronîzmê tê binavkirin. Anakronîzm di edebîyatê da bi awayên cuda tê dîtin. Carinan nivîskar ji nezanîyê carinan jî bi zanebûn bûyerên berê li gorî dema xwe, bi ziman û metaforên dema xwe dinirxîne, şîrove dike. Heke ev ji nezanîyê pêk bê ev wek kêmasîyekê tê dîtin. Di van cure mînakan da em pergî gelek rewşên absurd jî tên. Heke nivîskar bi zanebûn vê yekê dike û veneşêre bi ser de ew hewl bide ku ev kirina wî bê dîtin ev yek wek hêmanên "îronî" û "parodî" tê şîrovekirin. Anakronîzm di edebîyatê da herî zêde di romanên dîrokî da tê dîtin (Bingöl, 2019:60). Di romanan da –nemaze di romanên dîrokî da- yek ji sedemên herî girîng ya anakronîzmê bijartina vegêr û rola wî ya di romanê da ye. Wek mînak di riwangeha gişzan da vegêr her tiştê ku dê biqewimin bi kitekit

dizane. Di vê cure riwangehê da vegêr li ser her tiştî ye, li herî pêş e. Ew her car dikeve di navbera karakter û xwînerî da, şîroveyan dike û dixwaze fikrên xwe bi xwînerî bide pejirandin (Jale, 2006:15). Di romana *Zeynel Beg* da jî –ku ew jî bi riwangeha gişzan hatîye nivîsandin- carinan em ji ber destlêwerdanên vegêr mînakên anakronîzmê dibînin.

Wek mînak, wexta vegêr behsa qazîyê Hekaryan Pîroyê Mêrganî dike wî wek kesekî durû nîşan dide. Dibêje ku ew ji Kurdî zêdetir gotin û şîretên xwe bi Erebî vedibêje. Li ser vê yekê vegêr bi destlêwerdana li ser karakteran di navbera wê rojê û "roja me" têkilîyekê girê dide û dibêje *"**Di roja me de** jî mirov dibe şahidê vê şaşiyê"* (r. 42). Bi bawerîya vegêr "**Di wê serdemê de jî** carinan dîtinên qewmî diketin rêza duyemîn" Desthilatdaran li gor berjewendîyên xwe hêmanên nijadî, dînî û mezhebî wek çekekê bi kar anîne (r.191).

Vegêr carinan wexta ku karakterên xwe dide axaftin yan jî bi xwe tev li honaka romanê dibe -wek li jor jî me dît- ji bo "dema îroyîn" ji dîrokê mînakan dide, bi vê yekê ew dîrokê ji bo ku peyaman bigihîne îro bi kar tîne. Nivîskar ji devê karakterê bi navê Egîdê Koxî behsa azadîyê dike. Ew dibêje "azadî xwesteka me ya sereke ye". Bi bawerîya wî "ew qewmên azad nebin, ol û rêolên wan jî azad nîn in", "azadî bi koletîyê nayê guhertin" û "maka hemû azadîya, azadîya qewmîyetê ye" (r.55). Mîr Melek û kurê wî Mîr Zeynel jî perçebûna Kurdan û hebûna mîrektîyan di çarçoveya helwesta "qewmîyet"ê da şîrove dikin. Mîr Melek bandora şerê Safewî û Osmanîyan li ser Kurdan bi rola mezheban rave dike. Bi bawerîya wî şerê van herdu hêzan ji ber armanca "dagirkirina axa Kurdan, dîlgirtina desthelatdarî, talan û mêtina dewlemendîyên herêmê" (r.64) pêk tê. Mîr Zeynel jî dibêje ku di encama şerî da "birakujî"ya Kurdan dê heta hetayê berdewam bike. Ligor wî ew hêzên mezin dixwazin axa "me" talan û parve bikin, "me bi parvekirinê bixin bin destê xwe û bimêjin, kelatên me li pêşberî hevdu bikin çeper" (r.85). Piştî ku dewleta Osmanî mamê Zeynel Beg Seyîd Mihemed derdest dike û berî ku wî darve bikin Îskender Paşayê dewleta Osmanî jê ra dibêje ji ber ku wî dewleta Osmanî nas nekirîye cezayê wî mirin e. Seyîd Mihemed bersivê dide wî û dibêje "Ez li azadîya gelê xwe digerîyam. Ev kiryara te li dijî mirovatîyê ye û dagirkerî ye" (r.112). Bi Mêrxasê Sergivandeyî Hekarîyan gelek caran "rêveberên xwe bi lewnekî hilbijartinê xuya" kirine. Di sedsada 15emîn de jî ev rê û rêbaz derbasdar bûn, mîrekan jî bi vê rastîyê baş dizanîbûn" (r.34)[4] Ji van mînakan tê fêhmkirin ku nivîskarî bi helwesteka der-zemanî xwestîye di navbera dîroka Hekaryan ya sedsala 16an û rewşa Kurdan ya dema xwe da wekhevîyekê ava bike.



4 Mirov tênagihe madem ku rêveberên li mîrektîya Hekaryan bi lewnekî hilbijartinê dihatin hilbijartin nexwe nivîskarî bo çi behsa şerê mam û birazîyan yê li ser texê mîrekîyê kirîye û ew bi hilbijartinê nehatine ser text.

**2.4. Dîroknasî**

Çawa ku me di destpêkê da behsa danûstandina di navbera dîrok û edebîyatê da kir di romanên dîrokî da honaka berhemê li ser bûyer yan jî kesayetîyên dîrokî ava dibe. Romana *Zeynel Beg* jî herçend ku behsa jîyana mîrê Hekaryan Zeynel dike, ew di asasê xwe da beşek ji dîroka Hekaryan ya sedsala 16an vedibêje. Di vê berhemê da bûyer bi riwangeha gişzan (ji alîyê vegêr-nivîskarî ve) tên ragihandin. Têkilîya di navbera vegêr û karakteran da berhemê ji romanê zêdetir ber bi sînorê berhemeka dîrokî ve dibe. Her karakterek bi devê nivîskarî/vegêr diaxivin û bi çavên wî li meseleyan dinêrin û şîrove dikin. Herçend ku em navên karakterên cuda bibînin jî ya rast ew hemû ji devê vegêr/nivîskarî diaxivin, mijarê tînin li ser Kurdan. Lewma her karakterek wek dîroknasekî/ê ye. Vê yekê herî zêde em di civîna dîwanê ya Mîr Melek da dibînin. Endamên dîwanê wexta behsa kar û barê xwe dikin hema xwe ji bîr dikin û ji dîrokê mînakan didin, bi awayekî kronolojîk û bi kitekit behsa bûyerên dîrokî dikin.

Wek mînak wexta Mîr Melek behsa Kelata Colemêrgê dike gotinên yekî bi navê Mela Fîroz bi bîr tîne. Ew dibêje ku "Kelata Colemêrgê rengê Kelata Alamûtê ya bilindahîyên Çîyayên Elbrûzê dide" (r.22). Piştre Mîr Melek xwe ji bîr dike behsa Keleha Alamûtê û hikumdarê wê Hesen El Sabah dike.

Şêwirmendê kar û barê navxweyî Bazî, behsa pevçûna di navbera Safewî û Osmanîyan da dike û dibêje *"Farisan muhra Xelîfe Elî, Osmanîya jî ya Muavîye ji xwe re kirine mertal. Di bin vê bîr û bawerîyên rêolîyê de gelên herêmê, bi taybetî gelê Kurd li pêşberî hev dixapînin û radikin ser pêyan"* (r.24). 82

Şêwirmendê têkiliyen Îranê Mele Hişyar wexta behsa Şah Smaîl dike mirov dibêje qey em jînenîgarîya wî di berhemeka dîrokî da dixwînin. Ew dibêje ku "Şah Smaîl 17ê Tîrmeha 1487an li bajarê Erdebîlê ji dayîk bûye". Ew "di bingeha xwe de ji malbateke malşêx e. Kurê Şêx Heyderê kurê Şêx Cuneyd e." û "ji alîyê dayîkê ve jî nevîyê Hesenê dirêj e." (r.28)

Dizdarê Kelata Colemergê Mêrxasê Sergivandeyî rêzdarîya mîrektîya Hekaryan ji bîr û bawerîyên cuda ra weku kevneşopîyekê dinirxîne. Li gor wî "rehên vê kevneşopîyê jî ji kûrahîya dîroka desthelatdarîya Çîyayên Zagrosan" (r.34) tê. Wexta Mêrxasê Sergivandeyî behsa dîroka Asûrîyên li Hekaryan dike bi kitekit destnîşan dike ka ew cara ewil kengî, ji ber kîjan sedeman hatine Hekaryan, piştre çima li wir bi cih bûne, berî ku ew bên Hekaryan cih û warên wan li ku bû, behsa navê paytexta wan, komkujîyên li ser wan hwd. (r.37-38) dike.

Serşêwirmend Egîdê Koxî behsa binemala Osmanîyan, rewşa sîyasî ya dema damezirandina dewleta Osmanîyan, dewlet û hêzên berîya Osmanîyan li Anatolyayê, rewşa sîyasî ya wê demê, damezirandina dewletê, têkilîyên wan ligel Rûman dike. (r.53) Mîr Melek jî êrişên li ser Hekaryan yên Moxolîyan, Tirkmenan û pevçûnên navbera mîrektîyên Hekaryan û ya Bedlîsê vedibêje (r.58).

Ji bilî mînakên li jor nivîskarî di destpêka romanê da wek pirtûkeka dîrokê rûpela “Navarok”ê jî bi cih kirîye. Tê da navê beşên romanê, rûpelên wê hatîye nivîsandin. Di romanên postmodern da jî heman rêbaza rûpela naverokê ji bo nîşandayîna xerakirina kronolojîya dîrokê tê bikarînan. Di van cure romanên “intertextual” (kr. Navdeqî, tr. Metinlerarası) da romannûs; belgenameyan ji dîrokê qer dike û dixwaze pirdengîyekê bide romana xwe û ji xwînerî ra bibêje ku dîrok bixwe awayekî honandinê ye. Lê di romana Colemêrgî, ku romaneka dîrokî ya klasîk e, bicihkirina rûpela naverokê ne bi helwesteka postmodern hatîye kirin. Wek encama van mînakan mirov dişê bibêje ku roman wek berhemeka dîrokî hatîye nivîsandin.

**2.5. Pirçandî**

Pirçandî cara pêşîyê di sala 1971an da li Kanadayê derketîye. Ew modeleka pêkvejîyanê ye, bihevrebûna çand û neteweyên cuda diparêze. Di vê modelê da her nasnameyên çandî û civakî bi rengê xwe cih digire (Yakışır, 2009:23). Di romana *Zeynel Beg* da jî behsa pêkvejîyana Kurdên Misilman û Êzidî, Asûrî, Nastûrî, Cihû û Ermenîyan tê kirin. Nivîskar pirçandîya li Hekaryan wek dewlemendîyê, tunekirina vê weku “asîmîlasyona olî” û “helandina nirxên neteweyî” (r.17) dibîne.

Vegêr herçend ku pêşîyê dîmeneka aştîyane û pêkvejîyanê ava dike, piştre jî jidestçûyîna wê, kêmbûna hejmara Êzidîyan û tunebûna Cihûyan xemgînîya xwe vedibêje. Di vê dîmenê da dengê mela li mizgefta Melîk Esad tê. Piştre dengê dêra Ermenîyên li Paganê û ya Nastûrîyên Taxa Êrisanê tê bihîstin. Çend malên Cihûyên xwecihên Girikê Cihûyan di nav bêdengîyê de mane. Dengê Êzîdîyan li navenda bajêr û gundên dora wê êdî nayê bihîstin. Nivîskar windabûna vê pirrengîyê wek serwerî û yekdengîya Îslamê rave dike. (r.17)

Nivîskar vê dîmena pirçandîyê bi karakterên wek Mêrxasê Sergivandeyî û Midebir Rêbaz, cinartîya baş ya di navbera Asûrîyan û Kurdan da nîşan dide. Kesên herî xweşbîn û ji gelên din ra rêzgir Mêrxasê Sergivandeyî û Midebir Rêbaz e. Karê Mêrxas damezirandina hevsengîya di navbera Kurdan Misilman û yên Êzidî, Asûrîyan, Ermenî û Cihûyan e. Ew ji Kurdan zêdetir ji civakên din ra rêzê digire. (r.32) Ew dibêje ku li mîrektîya Hekaryan xweşdîtina bîrûbawerîyên cuda kevneşopîyeka kevnar e. (r.34) Midebir Rêbaz jî li hember dijminan behsa girîngîya tifaqa Kurdan û Asûrîyan dike. Bi bawerîya wî “dema dagirkerên biyanî bixwazin me lawaz bikin, pêşîyê destên xwe diavêjin pir rengî û pir olîya herêmê” Lewma divê ew “li hemberî vê dijminatîyê hişyar bin, derfetê nedin neyarên xwe yên ku dixwazin di herêmê de bêtifaqîyê çêkin” (r.38).

Di romanê da Asûrî piştî Kurdan li mîrektîya Hekaryan neteweya herî xwedî hêz e. Ew cînarên Kurdan yên qedîm in. Wek netew ew bi çend taybetîyên xwe tên nimandin. Yek jî vê jî dirûtina şel û şepikên xweşkok e (r.10). Kengî Kurd dikevin tengasîyê ew hawara xwe dibin Asûrîyan. Wek mînak wexta Zeynel Beg li hember mamê xwe Seyid Mihemed têk diçe ew xwe dispêre Asûrîyên devera

Talê û Bazê. Tê gotin ku "di şerê navxweyî de begzadeyên Hekaryan bêhtir bawerîya xwe didan eşîrên Asûrîyan" (r. 78) Nivîskar mînakên pêkvejîyanê yên di jîyana rojane da berdewam dike, wek çu pirsgirêkên dînî û çandî di navbera Kurdên Misilman û neteweyên dî yên nemisilman çênebûne. Wexta Zeynel Beg ji Hekaryan direve di nav zilamên wî da Cihûyek, pênc Asûrî, du Ermenî (r.89) cih digirin. Ne bi tenê di mîrektîya Hekaryan her wiha di mîrektîya Cizîrê da jî Asûrî hene û ew jî kesên bijarte ne. Wek mînak, Zeynel Beg di êrîşa çekdarên Mîrê Botan da birîndar dibe, jina mir wî dibe nik hekîmê bajêr yê herî navdar Xemoyê Asûrî. (r.105).

Heke em ji van mînakên li jor derbasî berawirdkirinekê navbera romanên Kurdî û Tirkî yên dîrokî bikin em dikarin bibêjin ku gelek di romanên dîrokî yên Tirkî da, yên ku behsa avakirina dewleta neteweyî ya Tirkîyeyê dikin, neteweyên ne Tirk weku dijmîn tên nimandin. Lê di romanên dîrokî yên Kurdî da (nemaze romanên Mehmed Uzun) em dijberî vê yekê îdealîzekirina gelên Asûrî, Ermenî û Cihûyan dibînin. Lê gelên Tirk, Ereb û Faris bi gelemperî ji derveyî vê yekê da ne. Bêyî rexneyan yan jî rastîyên dîrokî helwesta nivîskarên Kurd ya li ser pirçandîyê bi motîvasyoneka îroyîn ra eleqedar e. Ji ber ku wek tê zanîn "berîya serdema modern sînorên herî hişk ên di navbera cimaetan de ji sînorên neteweyî zêdetir yên dînî" (Adsay, 2014:136) bûn. Di romana *Zeynel Beg* da dijberî vê yekê heçko çu pisgirêkên dînî di navbera Kurdên Misilman û Mesîhî û Cihûyan tune bûne, ew bi hev ra aşîyane jîyane hatîne nimandin. Ev jî nîşan dide ku Î. Colemêrgî ne di çarçoveya rastîyên dîrokê lê bi nêrîneka modern mijara pirçandîyê şîrove kirîye. 

**2.6. Hêmanên Zeman û Mekanî**

Di romanên dîrokî da li gor hêmanên romanê yên dî (zeman, mekan, kes) vegotina "bûyer"ê li pêş e û hêmanên ji bilî bûyerê di rêza duyemîn da cih digirin (Jale, 2006:15). Di romana *Zeynel Beg* da jî wek vê yekê piştrast bike ji hêmanên mekan û zemanî zêdetir behsa bûyerên dîrokî tê kirin. Nivîskar jî ji bo ku bûyerê li ber çavê xwînerî şênber bike behsa dîroka bûyeran yan jî mekanên dîrokî dike. Wexta Zeynel Beg tê Westanê û dê li mizgeftekê nimêjê bike tê gotin ku ev mizgefta "kalikê wî Êzdînşêrê yekemîn sala 1257an de" çêkirîye. Bûyer bi awayekî kronolojîk diqewimin. Lewma di zemanî da paşveçûn tune ne lê wek di binbeşa anakronîzmê jî me dîyar kir, bûyer li gor zemanê îro hatîne şîrovekirin. Di vê romanê da wek romaneka klasîk bûyer li gor kronolojîyê tên ragihandin. Lewma ji 16 beşan 9 beş bi têgehên zemanî dest pê dike:

1: "Nîveka meha Kanûna paşîn bû" (r.7). 2: "Dawiya meha Reşemîyê bû" (r.13). 3: "Çiya, kêrî, banî, zînî û zozanên ku zivistanê zêde berf dîtibûn; meha gulanê kirasekî kesk li ber xwe kiribûn" (r. 18). 4: "Çend roj ji meha Xizîranê borî bûn" (r. 61). 7: "Zivistana sala 1551'an a zayînê Zeynel Begê li Stenbolê derbas kir" (r. 98). 8: "Ji sala 1514'an anku ji serdema Cenga Çardêranê heta 1548'an di navbera Osmanî û Safewîyan de li ser hewzeya Gerava Wanê bê navber ceng hatin kirin" (r.106). 14: "Zeynel Begê dimeha Razberê de bi Atîye Xanimê re zewicî" (r.178). 15: "Zeynel Begê ku temenê wî ji 70'yî borî, bi biryara xwe dest ji

mîrîtîya Hekaryan berda" (r.187). 16: "Amadekariyên gora Mîr Zeynel ên li hewşa medreseya wî ya li Taxa Binqesrê nêzî Çemê Qetremasê bê navber berdewam bûn. Demsala biharê ya ku bi gîyayên kesk xemilîbû zû rûyê xwe nîşanî xwecihên kelata mîna eywaneke navçîyayan dabû" (r.193).

Wek di mînakên jor da jî tê dîtin zemanê rûdanê girêdayî bîyografîya Zeynel Beg û rûdanên dîrokî bi awayekî kronolojîk diguhere. Lê di dîyarkirina zemanê vegêranê da vegêrê bi riwangeha gişzan bûyeran radigihîne li gor zemanekî modern (dema me) bûyeran şîrove dike.

Di romanê da cih û mekanên wek; kelat, çiya, zozan, qesr, birc, tax, çem, rûbar, kanî, girav, dêr, mizgeft cih digirin. Ew mekan bi tenê wek dekoreka ku divê di sehneyekê da pêk were hatine dîyarkirin û ew carinan bi şibandinên heman mekanên dîrokî yan jî bi tenê wek warên lehengên dîrokî tên nîşandan. Lewma nivîskar bi kitekit behsa mekanan nake. Wek mekanê sereke yê rûdanê Hekarî û navenda wê Colemêrg derdikeve pêş. Ligel vê yekê ji ber ku ew romaneka dîrokî bûye bûyer di nav erdnîgarîyeka pir fireh diqewimin. Wek mînak ji bilî mekanê sereke em van mekanên cuda dibînin;

Bajar û herêm (Amêdîyê, Gever, Şaxê, Miks, Westan, Elbak, Elkê, Cizîr, Stenbol, Wan, Bedlîs, Xîzan, Soma, Tebrêz, Xoşab, Bahdînan, Rewandiz, Hewlêr, Bosna), kêrî (Kêrîya Silehyan, Kêrîyê Rewanan), mizgeft (Mizgefta Gulîreşî, Mizgefta Melîk Esad), dêr (Dêra Paganê, Dêra Girava, Dêra Ixtirmanê), Girav (Gerava Wanê, Girava Ixtirmanê), meydan (Meydanê, Meydanok), keleh (Keleha Bayê, Keleha Colemêrgê, Keleha Amêdîyê, Keleha Xoşabê, Kelata Çelê, Kelata Pîzanê), çiya (Çîyayê Mere, Çîyayên Zagrosan, Çîyayê Simbî, Çelê Mezin, Çelê Biçûk, Garê, Selê Bayê, Cudî, Girê Çungurî), çem (Çemê Qetremasê, Dîcle, Serinkê, Seqavkê), Gelî (Gelîyê Dirîyan, Gelîyê Muzûrka, Gelîyê Erzikînî), tax (Taxa Golê, Taxa Merzanê, Taxa Hêşetê, Milkê Qazî, Milkê Mela Husên, Kanîkewkan, Binqesir, Kanîmîran, Êrisan, Feqîran, Qiran), gund (Tîyar, Şawîte, Heleyîsê, Şahkûtan, Kertînis, Berwarî, Nûdiz, Talê, Bazê, Gundê Mizgeftê, Xana Sêgundan, Kinyaniş, Îspêra, Selanê, Koçanis, Geremus), deşt (Deşta Geverê, Deşta Enter, Deşta Xanê, Mehemda, Deşta Rezî), gol û kanî (Gola Zurîyan, Gola Cemedê, Kanîya Rezî, Kanîya Mexîtara, Kanîsefaran, Kanîya Hecîyan, Kanîsarkê, Kanîya Mîran, Kanîya Şimşimûkê), zozan (Berçelan, Helêlê, Nebirnav), Zînîya Mexîn, Serê Talê, Serê Solan, Siwara Xelê, Tîrmilên Kanîbî û Gêzeroyê, Gupsî, Kolikên Keşanê, Dola Bêzîvê, Nêrwe, Mêrgezer.



Wek li jor jî tê dîtin ji alîyê mekanî ve em ji mekanên cuda pir navan dibînin. Lewma nivîskar ji alîyekê ve nexşeya herêma Hekaryan yek bi yek nîşan dide lê li ser van mekanên navborî bi awayekî kûr nasekine, agahîyan nade, ew bi tenê wek nav di romanê da cih digirin. Lewma fonksîyona wan ya di romanê da wek dekorekê ye. Nivîskar ligel rûdanên dîrokî dixwaze erdnîgarîya Hekaryan jî bi tenê wek nav nîşan bide. Jixwe heke wî yek bi yek şayesandina van mekanan bikira û derbarê wan da agahî dabûya ew ê ji sînorê romanê derbas bûya.

Nivîskar Kelata Colemêrge dişibîne Kelata Alamûtê (r.22). Ew wek mekanekî şerî tê derpeşkirin. Tê gotin Kelata Colemêrge "li pêşberî êrîşên mîrekên cînar warê berxwedanê yê bêkêmasî ye" (r.32) Ji ber asêbûna û erdnîgarîya wê, herêma Hekaryan niştecihên xwe ji êrîşên derveyî parastîye û ev war ji bo wan bûye cihekî ewle. Ew "gelî, dol, newal, zozan, kêrî û banî" (r.57) ji leşkerên Hûlagoyê Moxolî ra jî bûye goristan. Wexta nivîskar behsa desthilatdarîya mîrekîya Hekaryan dike vî mekanî di nav kevneşopîyekê da rave dike. Bi bawerîya wî "rehên vê kevneşopîyê ji kûrahîya dîroka desthelatdarîya Çîyayên Zagrosan" (r.34) tê. Bi gelemperî wek mekanekî, herêma Hekaryan wek qada êrîşan tê dîyarkirin. "Dijmin" her car dixwazin vê derê "dagir bikin" (r.38). Li hemberî vê yekê ew her wiha wargehê pêkvejîyanê ye, "çiya, gund, zozanên û geliyên hêla Hekaryan bi rengîniya qewmiyet û olên cuda dewlemend bûye" (r.37). Li wir Kurdên Misilman û yên Êzidî, Asûrî, Ermenî û Cihû dijîn. Mekanên ku ew dijîn jî tên dîyarkirin; Asûrî gundên Talê, Bazê û Geremûsê (r.10), Ermenî Paganê, Cihû Êrisanê (r.89) Êzidî jî li Pîrodanê (r.156) rûdinin. Carinan jî mekan wek cihên hilberîna mehsûlekî yan jî tiştekî tê dîyarkirin. Weku mînak "Biyadir" bi birincê xwe, li "Berçelan" masterûn û "Gêman" jî bi doşava xwe tê nasîn. (r.60) Herçend ku kêm jî be carinan em şayesandinên mekanan jî dibînin. Wexta nivîskar behsa Keleha Xoşabê dike dibêje ku "xîmê kelehê ji alîyê malbata Silêman Begê Zer ve" hatîye danîn. "Dergehê wê" vedibe "alîyê rojavayê. Bedenên alîyê başûr û rojhilatê li ser zinarên bilind" hatine avakirin. "Alîyê bakûr ji bo parastin û ewlekarîyê bi çend dîwaran ji axeşînê çêkirî" hatîye dorpêçkirin. (r.108).

Wek di mînakên li jor da jî tê dîtin di romana *Zeynel Beg* da hebûna hêmana mekanî bi tenê ji bo rûdana bûyerên dîrokî hêmaneka alîkar e. Nivîskar ji ber ku bûyer tê da diqewime û ji bo ku bê zanîn bi tenê navên mekanan dide. Peywira mekanî ji vê zêdetir nîne. Lewma mekan di geşedana bûyeran da xwedîyê roleka sereke û fonksîyonel nîne. Bi tenê di bilêvkirina navên wan da em mekanan dibînin, lewma şayesandinên mekanan jî bikitekit nayên kirin.

**Encam**

Îhsan Colemêrgî di romana *Zeynel Beg* da ji bo avakirina hişmendîyeka neteweyî ji dîroka mîrektîya Hekaryan model û mînakên îdeal derpêş kirîye. Nivîskarî bi nêrîneka îroyîn meseleyên dîrokî şîrove kirîye, bi mînakên kesên îdelîzekirî û karakterên dîroknas, di nav pirrengî û pirçandîyê da nimandina pêkvejîyanê kirîye. Lewma di vê romanê da dîrok ne ji riwangeha dema bûyer rûdane lê bi çavê îroyîn hatîye nivîsandin. Kesên di romanê da jî ne wek karakterekî lê weku tîp yan jî modelekê xwedîyê taybetîyên hevpar in. Ji ber bîr û bawerîyên xwe yên modern ew naşibin mirovên ji dema xwe. Nivîskarî herçend xwestîye nîşan bide ku ew behsa kurtejîyana mîrê Hekaryan Zeynel Beg dike di rastîyê da armanca wî ji qedera Zeynel Beg ya takekesî zêdetir dîroka mîrektîya Hekaryan ya sedsala 16an e. Lewra armanca nivîskarî ya pêşîyê ragihandina bûyerên dîrokî yên vê sedsalê ne. Ji ber vê yekê di romanê da bûyer dibe hêmana

sereke û hêmanên zeman û mekanî weku hêmanên alîkar tên derpêşkirin. Ev hêman bi tenê ji ber pêdivîya qewimîna bûyerê di romanê da cih digirin lewma xwedî roleka fonksîyonel nînin. Dîsa ji ber armanca nivîskarî ya ragihandina bûyerên dîrokî ji bilî zarokatî û zewaca Zeynel Beg em di romanê da pêrgî jîyana rojane nayên. Dibe ku nivîskar bixwe jî hay ji vê kêmasîyê bûye û ji gotinên pêşîyan, biwêjan, bawerîya gelêrî, lîstîkên zarokan yên gelêrî, xwarinên herêmî çend mînak dane. Ji ber van hêmanan berhem hema ku çêjekî edebî dide bi destlêwerdanên vegêr ev zêde berdewam nake. Sedemeka dî jî ew e ku nivîskarî zêde li rêyên avakirin û xeberdana karakterên dîrokî negerîyaye ka gelo karakterek di romaneka dîrokî da dişê çawa biaxive, taybetmendîyên dema xwe nîşan bide û wek xwe bibe. Dijberî vê yekê nivîskarî destûr nedaye ku karakter bi xwe bêhnê bidin û bistînin. Wî her car li ser navê wan axaftîye, bûyer ne bi çavê wan lê li gor şert û mercên dema xwe ragihandîye. Ji ber helwesta nivîskarî ya dîroknûsîyê em tênagihin ka gelo bûyerên ku di sedsala 16an da li mîrektîya Hekaryan rûdane bandoreka çawa li ser çarenûsa ferdan û jîyana wan ya takekesî kirîye. Nivîskar li ser derûnîya lehengan pir kêm sekinîye û ji bilî çend şayesandinên fizikî karakter bi awayekî berfireh nehatine honandin. Ji ber destlêwerdanên nivîskarî em, ew dîroka tê behskirin di nav atmosfera wê demê û peywenda têkilîyên mirovan yên rojane da nabînin. Herçend ku armanca nivîskarî nivîsandina romaneka dîrokî bûye ew ji fikarên estetîkî zêdetir bi motîvasyoneka îdeolojîk tevgerîyaye. Wî carinan ji bîr kirîye ku ew romanekê dinivîse. Lewma ev helwesta wî ew ji romannûsîyê zêdetir ber bi dîroknûsîyê birîye. Nivîskar di nav sînorê teng yê dîroknûsîyê da xwe ji wê azadî û qada berfireh ya romannûsîyê bêpar kirîye. Bi tenê dîroknasîyê jî têrê nekirîye ku ew romaneka dîrokî ya edebî binivîse.



**Çavkanî**


Adsay, F. (2013). Romana Kurdî (Kurmancî) ya Dîrokî: Bîra Civakî û Nasname. Teza masterê ya neçapkirî, Zanîngeha Mardin Artuklu, Mêrdîn.

________ (2014). Daxwaz û Endîşeyên Îroyî di Romanên Dîrokî de: Xwendineke Muqayeseyî li ser Hawara Dîcleyê û 3 Gav û 3darek. Remezan Alan-Ergin Öpengin (Ed.), di nav Tîr û Armanc (Gotarên Rexneyî Li Ser Edebîyata Kurdî ya Modern) (r.131-153). Stenbol: Peywend.

Altuğ, F. (2017). İstinat Duvarı Olarak Cezmi: Tarihe Müstenit Hikaye. Zeynep Uysal (Ed.), Edebiyatın Omzundaki Melek (Edebiyatın Tarihle İlişkisi Üzerine Yazılar) içinde (s. 149-206). İstanbul: İletişim.

Argunşah, H. (2010). Tarihi Romaynın Yükselişi. Hece Türk Romanı Özel Sayısı (2.bs.). (s. 454-464). Ankara: Hece.

Bingöl, U. (2019). Modernizmden Postmodernizme Eleştiri Terimleri Sözlüğü (Tanımlar, Açıklamalar, Örnekler). İstanbul: Akademik Kitaplar.

Colemêrgî, Î. (2018). Zeynel Beg. Diyarbekir: Lîs.

Çetin, N. (2008). Roman Çözümleme Yöntemi (6.bs.). Ankara: Öncü Kitap.

Hesen, E. (2019). Romana Dîrokî Bîr û Nasnameya Civakî ye. Kovara Rojava, 2, 32-35.

Jale, G. (2006). Reşad Ekrem Koçu'nun Tarihi Romanları. Yayımlanmamış doktora tezi, Afyon Kocatepe Üniversitesi, Afyon.

Lukacs, G. (2008). Tarihsel Roman. (İsmail Doğan, Çev.). Ankara: Epos.

Ölmez, C. (2018). Temsîlên Romanên Dîrokî Yên Eliyê Evdilrehman. The Journal of Mesopotamian Studies, 3/2, 43-63.

Saadi, Sahand S. (2016). Rehendên Dîrokî Di Romana Xewna Zelamên Îranî Mardîn Îbrahîmê. Teza masterê ya neçapkirî, Zanîngeha Yüzüncü Yıl, Wan.

Turan, C. (2020). Di Navbeyna Dîrok û Edebiyatê de: Teknîka Biyografî û Otobiyografiyê di Romanên Erebê Şemo Berbang û Şivanê Kurmanca de. M. Zahir Ertekin-Mehmet Yıldırımçakar (Ed.), Di nav Destpêka Romana Kurdî (Gotarên li ser Romana Êwra Kavkazê) (r. 195-210). Wan: Peywend.

Yakışır, A. Nur (2009). Modern Bir Olgu Olarak Çokkültürlülük. Yayınlanmamış yüksek lisans tezi, Selçuk Üniversitesi, Konya.

Yalçın-Çelik, S. Dilek (2005). Yeni Tarihselcilik Kuramı ve Türk Edebiyatında Postmodern Tarih Romanları. Ankara: Akçağ.

**Çavkanîyên Elektronîk**

Bernamegeh. Jiyana İhsan Çölemerikli-(Îhsan Colemêrgî) https://www.bernamegeh.org/2019/08/27/jiyana-ihsan-colemerikli/, (Dîrok: 28.01.2020),

Zirarî, S. Roman û Dîrok. http://candname.com/roman-u-dirok/ (Dîrok: 25.03.2017)